Du helbestên ŞARL BODLÊR

(1)
Serê te, liva te, çeşma te,
hemû xweşik in rind in,
mîna dîmenek siruştî.
Herdû hinarkên rû yê te, dikenin
mîna sirek bayê xweş,
hênik di esmanekî sayî de.
Bi bûrîna te keder çû ji nişkê ve,
bi tendirustiya hiş çû
diçirisand mîna ronahiyê,
bi mil û piyên te.
Rengan diçirisandin,
paşî belav dike xemlên xwe,
davêje di nêv hişê helbestvan,
wênên kulîlkan didin semaya Balletê.

(2)
Oxirxwestina canê
Wa mala bavê min, ew cihê ku min hirî lê dirêsa,
di kuncika agirdanê de,
rûniştim şevbuhêrkên zivistanên dirêj.
Min li sirûdên "Lorên " yên kevin guhdar dikir.
Dem hatiye ku ez xatir ji we bixwazim.
Di malên me yên nû de,
hemû şevbuhêrk, derketina şoreşên nû,
ji min dixwazin…
Dê ezê herim malên ez wan nenasim.
Kengî emê hevdû bibînin?
Ma gelo emê hevdû bibînin!?
Wa mala bavê min,
ew mala min ya ku ez jê hez dikim.

Wergerandina ji Ferensî: Enahîta Hemo